Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1247 12-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# 'Şehîd Ebdulqadir evîndarê axa xwe bû'

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Hevjîna şehîd Ebdulqadir Ibrahîm Raniya Ibrahîm destnîşan kir ku şehîd Ebdulqadir xwedî hestên welatparêziyê bû, di heman demê de mirovekî fedekar û azadîxwaz bû.**

Şehîd Ebdulqadir Ibrahîm di sala 1960'an de li Gundê Girkê Dijwêr yê girêdayê bajarê Girkê Legê hatiye dinê. Şehîd Ebdulqadir ji malbateke welatparêz de çavê xwe li dunyayê vekir û birayê wî di sala 1984'an de tevlî Refên Tevgera Azadiyê bû û di sala 1990'î de li çiyayên azad bi qehremantî gihîşte asta şehadetê. Şehîd Ebdulqadir di sala 1985'an de li bajarê Qamişlo zewcî û 7 zarokên wî hene; 2 keçik û 5 lawik in. Di sala 1990'î de şehîd Ebdulqadir diçe serdana Rêber Abdullah Ocalan li Lubnanê. Şehîd Ebdulqadir ji zaroktiya xwe ve bi Tevgera Azadiyê re girêdayî bû û bi destpêka şroreşa Rojava di sala 2012'an de û dema ku Saziya Malbatên Şehîdan hate avakirin û ji destpêka avakirina wê wî cihê xwe di nav de girt û bi rihekî şoreşgerî tevdigeriya.

Bi ketina rêjina Baas re, dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe li ser herêmê dijwartir kir û bi taybet li ser bendava Tişrînê û Qereqozaqê. Ev êrişên dagirkeriya Tirk heya roja îro jî bi rengekî hovane didome. Gelê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina destkeftiyên şoreşê, ax û ava xwe berê xwe dide bendavê û nobetê li wir digrin. Lê belê ev yek ji dagirkeriya tirk re giran hat, her gelê ku li bendava Tişrînê nobet digire, wan dike hedef û wan bombebaran dike. Di 17'ê Çeleyê de welatiyên bajarê Qamişlo bi îradeyekî xurt berê xwe



dane bendava Tişrînê, mixabin di 18`ê Çileyê de dagirkeriya Tirk welatiyên ku li bendava Tişrînê nobet digirtin kirin hedefa û komkujî li ser gel pêkanî û di encamê de bi dehan şehîd û birîndar çêbûn. Yek ji van şehîdan jî Ebdulqadir Ibrahîm bû.

Di derbarê kesayet û jiyana Şehîd Ebdulqadir Ibrahîm de hevjîna wî Roniya Ehmed Remedan ji Rojnemeya me re axivî.

**'Wî ji bo xizmeta gelê xwe kar û xebat dimeşand'**

Hevjîna Şehîd Ebdulqadir Ibrahîm Roniya Ehmed Remedan diyar kir ku şehîd Ebdulkadir ji bo malbat û her kesî hevalekî rast û dirûst bû û wiha domand: "Şehîd Ebdulqadir Ji bo min weke hevalekê bû. Ev 40 salên me ye ku me bi hevre jiyan dikin, rojekî dilê tu kesî nehiştiye. Şehîd Ebdulqadir kêfxweşî dikir nava dilê her kesê derdora xwe, kesayetekî pir bi coş û kelecan bû. Heya roja ku çû bendava Tişrînê ku niha bi bendava şehîdan û berxwedanê tê nasîn, min jê re got: Xwe baş biparêze ku tiştek ji te û hevalên te newe; wî bersifa min da û got: "Ji her kesî re şehadet dernakeve, ma ji kî re derdikeve ku hevjînê wan şehîd be, bila her dem serê te bilind be." Ji ber vê yekê wî bi dil û can rêya serbilindahiyê hilbijart, ez jî pê serbilindim. Tevî ji ber şehadeta wî ez dilgiranim, lê serê min pê bilinde. Şehîd Ebdulqadir hezkirin û eşqa wî ji welatê wî re pir mezin bû, girêdana wî ji welatî wî re ne ji rêzê bû. Her dixwest pêşengtiya her kar û xebatekî bike, di kesayeta wî de fedekariyeke mezin hebû. Ew li pey serkeftina gelê xwe û Kurdayetiyê de çû. Hêviya me pir mezine ku xwîna zarokên me li erdê nemîne, di heman wextî de wê dagirker bişkin û gelê Kurd serbikeve."

Di 17'ê Çileyê de gelê Qamişlo xwe gihandin bendavê ku vê yekê ruhê berxwedanê zindî kir. Şehîd Edulqadir bi coşekê mezin berê xwe da bendava Tişrînê, her wiha bi ruhê ciwantî tevdigeriya. Kenê li rûyê wî û kelecana ku li hundirê wî ji derdorê xwe re jî belav dikir. Şehîd Edulqadir ji bo berxwedanê mezintir bike û cihê xwe di nav de bigire, bi hemû îradeya xwe ya xurt û di heman demê de bi kesayeta xwe ya şoreşgerî tevlî berxwedana bendava Tişrînê bû û bû yek ji qehremanên ku li bendavê canê xwe feda kir.

**'Şehîd Ebdulqadir her dem giringî dida karên xwe'**

Raniya di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ji sala 2012`an de şehîd Ebdulqadir Ibrahîm di Saziya Malbatên Şehîdan de cihê xwe digirt. Her dem giringî dida karên xwe, ji ber ku ji kar û hevalên xwe hezdikir, Her wiha di mal û nava hevalên xwe de xwedî zimanekî xweş bû. Di heman demê de şehîd Ebdulqadir bi exlaqê xwe yê baş dihat naskirin û tu pirisgirêkên wî bi tu mirovî re tune bû. Bi awayekî rast tevdigeriya û bi wijdan kar dikir. Bê guman me di demên dawî de dîmenên bendava Tişrînê didîtin



ku çawa dewleta Tirk a dagirker komkujiyan pêk tîne, ema kêleka wê jî gelê me dest bi dîlanê kirin û berxwedana xwe domandin, tilîliyê dayikan, dîlana gelan û dirûşmeya wan hîn mezintir bûn. Berxwedaniya ku niha ji aliyê gelan ve tê kirin ev bi serê xwe serkeftinek e."

**'Em xwedî xak û doza rewa ne'**

Hevjîna şehîd Ebdulqadir Raniy Ehmed Remedan di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ev ne cara yekê ye ku dewleta Tirk a dagirker komkujiyeke wiha pêk tîne. Dewleta Tirk zarokên me sêwî dike û komkujiyan pêk tîne. Armanca dewleta Tirk jî zelal e, koçberkirina me ye. Dewleta Tirk a dagirker nikare îradeya me ya xurt têk bibe. Em xwedî xak û doza rewa ne. Emê li pey şopa zarokên xwe bin. Bendava berxwedanê ya Tişrînê wê bibe sembola serkeftina Rojavayê Kurdistanê. "

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kodqulêr e:**
- Bi kêrî tiştekî nayê.

**Ku bi hirî be wê li nava kerî be:**
- Ku bi kêr were wê ew jî li cem yên weke xwe be.

**Kul û kor li hev civiyan li dikana Evdilor:**
- Dema yên bi kêrî tiştekî neyên tên cem hev hingê tê gotin.

**Ku xaliq wisa be wê mexlûq jî wisa be:**
- Tiştên wî, kirinên wî, berhemên wî jî li gorî wî ne; ka çawa ew bi kêrî tiştekî nayê tiştên wî jî bi kêrî tiştekî nayên.

(Ji Firewn re dibêjin, madem tu xaliq î ka mexlûqekê çêke. Bi şev bazgûrî Xwedê dibe. Dibêje, ez evdê te me, min şermezar neke. Ezê tiştekî çêkim tu jî ruh berdiyê. Roja din civak kom dibe. Ew jî hin herî di destê xwe de distire û kumê xwe datîne serê. Dîsa di dilê xwe de bazgûrî Xwedê dibe. Piştî qasekî kumê xwe radike. Kêzika gûgerênik ji bin derdikeve. Dibêjin, 'ka çawa xaliq e wisa jî mexlûq e. (Li gorî xaliq mexlûq çak e, ku xaliq wisa be wê mexlûq jî wisa be)

**Li gorî mak e, golik pak e:**
- Tiştên wî, kirinên wî, berhemên wî jî li gorî wî ne; ka çawa ew bi kêrî tiştekî nayê tiştên wî jî bi kêrî tiştekî nayên.

**Li qûnê rûnişt:**
- Tiştekî wî nema; êdî nikare kar bike.

**Mala Şeref bixwe hindik bûn; ew jî hin kor, hin şil, hin seqet bûn:**
- Dema hin kes yan hin tişt hindik bin û ew jî bi kêrî tiştekî neyên hingê tê gotin.

**Nahêje seriyek pîvaz:**
- Ji bo kesê beredayî û bi kêrî tiştekî nayê tê gotin.

**Nahêje sergîneke:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

bi kamîreya Esma Mistefa




## Roja Reş wê veguhere Roja Azadiya Gelan...



Kompoloya Navneteweyî ya ku 9'ê Cotmeha 1998'an di şexsê mîmarê Şoreşa Kurdistanê Abdullah Ocalan de li dijî gelê kurd hat destpêkirin û di 15'ê Sibata 1999'an de Rêber Apo hate revandin û radestî dewleta Tirk hate kirin. Ev 26 sal in di şexsê Rêber Apo de qirkirina gelê kurd tê armanckirin.**R-3**

## 'Gazî şehîdên nemir in'

Gaziyên şer Arîn Koçer û Zîlan Hesekê anîn li ser ziman ku Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrîk pêşengên jinên azad bûn û tevî astengiyên xwe jî xebatên şoreşê nîvcoyî nehiştin û wiha gotin: "Navê gazîtiyê pîroz e û em ê layiq bibin."**R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1247 12-Sibat-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Divê gel li hember pêvajoyê şiyar be'



Berdevka Meclisa Jin a PYD'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Horiye Şemdîn da zanîn ku ji bo şîrovekirina geşedanên dawî yên li Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê diqewimin, ew rêzecivînan ji gel re li dar dixin û got, "Pêwîste gel li hemberî siyaseta ku tê meşandin û girîngiya parastina axa xwe; serwext be."**R-5**

## 'Armanca me pêşxistina çand û hunerê di nava civakê de ye'



Rêvebera Koma Şehîd Elfetiriya ya bajarê Dêrikê Zîlan Sîda diyar kir ku kar û xebatên wan di asteke baş de têne meşandin û got, "Koma me ji bo 8'ê Adarê û Newrozê amadekariyên xwe dike, me di destpêkê de hazirtiya roja 8'ê Adarê kiriye û me pênc stran ji bo wê rojê amede kirine."**R-7**

# DIVÊ VÎNA JINÊ DI SIBEROJA SÛRIYÊ DE MISOGER BIBE

Piştî hilweşîna Rêjîma Essed û hatina desthilatdariya Şamê ya nû, careke din hişmendiya paşverû ya li dijî hebûna jinê derkete pêş. Hişmendiya cîhadîst û nûnerên wê hewil didin bi rêya çeteyên girêdayî Tirkiyê ku cil û bergên xwe guhertine, dewletekê ku jin tê de bindest be ava bikin. Li ser wê bingehê divê li hember vê pêvajoyê hemû jinên Sûriyê bibin yek û bi sîstemeke wekhev, demokrat ku tê de maf û îradeya jinê parastî be, bang bikin û têkoşîna xwe bighînin lûtkeyê.**R-2**





## 'Yekem car e ku wê kurdên Rojava tevlî Konferansa Miyûnix bibin'

Çalakvanê kurd Yûnis Bahram yek ji kesên ku wê tevlî Konferansa Miyûnix bibe û tê de biaxive diyar kir ku yekem car e wê kurdên Rojava tevlî Konferansa Miyûnxê bibin û got, "Di Konferansa Ewlekariyê de ez ê pirsa kurdî, Rêveberiya Xweser û DAIŞ'ê gotûbêj bikim."**R-4**

Berê jinê didin mirinê
Nehîr pale R-2

Dewleta Tirk ji bo dagirkirinê li benda piştgriya Trump e
Zekî Bedran R-5


Rêwîtiya Aştiyê...
Farûk Sakik R-5


Dema Ku Rewşenbîr Rêya Xwe Winda Dikin
Kemal Necim R-7

# ‘Divê îradeya jin di siberoja Sûriyê de misoger bibe’

Endama Desteya Serokatiyê a Partiya Sûriya Pêşeroj Zelal Ceger da zanîn ku divê di pêvajoya nû ya Sûriyê de mafê jin bê parastin û got “Mijara me ya sereke rola jin di pêvajoya siyasî a nû de ku çawa dikare rol bilîze û mafê xwe biparêze ye”.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Bi hilweşîna Sîstema Baas di Sûriyê de, hêvî û xeyalên gelên Sûriyê weke ku hatin pêkanîn û dawî li sîstema dîktator û tundrew hat. Bê guman ev hêvî û xeyalên wan yên ji bo avakirina Sûriyeke aram, aşîtî û mafê gelan parastî be çiqas cihê xwe girtin; girîng bû. Lê desthilta Şamê ya nû ku serweriya xwe li ser Sûriyê îlan kiriye, tu guhartinên erênî nedaye avakirin. Tersî wê hewildanên ku Sûriye ber bi rewşeke aloztir û xetertir ve biçe hene. Bê guman di vê merheleyê de rewşa jin di Sûriyê bi giştî de divê were destgirtin û nirxandin. Her wiha çiqas mafê jin wê di sîstema nû de parastî be yek ji xalên herî girîngin. Girêdayî rewşa jin di siberoja Sûriyê de, endama Desteya Rêveber ya Partiya Sûriya Pêşeroj Zelal Ceger ji rojnameya me re axivî.





### Rêxistinbûna jin di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de

Zelal di destpêkê de bal kişand ser rol, kar û xebata jina Kurd di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û wiha got: “Kar û xebatekî gelek mezin ya jin ji destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê ve tê meşandin. Helbet ev xebat ne ji ber xwe ve hate meşandin, ji ber bingehekî wan ya rêxistî ji salan ve hatibû pêşxistin. Ew jî xwe disipêre gera Tevgera Azadiyê yên ji salên 80’î ve li Rojavayê Kurdistanê hatibûn destpêkirin. Mîrasê ew keda ku hatibû dayîn jî em dikarin bêjin bi destpêka şoreşa Rojava re hate dîtin. Li ser vê esasê dema ku şoreş li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê hate detpêkitin, rêxistinên me yên jin weke Kongira Star hebûn. Ev Rêxistin karîn daha zîdetir di Rojava de rol bilîzin û asta têkoşîna Tevgera Azadiyê bilindtir bikin. li ser van bingehan hêzên ku bi rastî xwedî li vê şoreşê derkevin weke YPJ, Asayîş, Hêzên Parastina Cewherî hatin avakirin. Jin bi avakirina sîstema meclîs û komînan re karî cihê xwe weke hevserok di asta rêveberiyê de bigre. Êdî jin di siyast, xebatên aborî, dîplomasî û civakî de cih girt û pêşengtî ji pêvajoyê re kir. Ji lewra dema em niha li salên 2024-2025 meyze dikin jin bi karektêra xwe ya heyî mukemel derketiye holê.

Bê guman ji bo em vê xebatê û têkoşînê bilind bikin ne tenê jina Kurd, di pêşengtiya jina Kurd de, hemû jinên herêmê bi hemû pêkhate û baweriyên wan hembêz kirin û bingeheke rêxistinkirî pîroz dane avakirin. Em dibînin ku Kongira Star, Kombûna Jinên Zenûbiya û Meclîsa Jina Sûrî hatine avakirin, di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xwe kom kirine û yekîtiyeke xwe dane avakirin. Her wiha di asta xebatên giştî, di Rêveberiya Xweser de û di nava partiyan de jin xwesertiyeke xwe avakiriye û di nava sîstema heyî de rol dilîze û li ser vê bingehê di qadên bîrdozî, civakî û leşkerî de têkoşîna xwe bilidtir dike”.

### `Ji rêvebriya nû qebûlkirina hemû netew û pêkhateyan tê xwestin`

Zelal da zanîn ku Sûriye qonaxeke nû jiyan dike û sîstemeke demokratîk ji Sûriyê re divê û wiha pê de çû: “Di encama neguhartina di sîstema Sûriyê û rêjîma Esed de ku ji tu gelên herêmê re nebû sîstemeke demokratîk û wekhevî avanekir. Piştî serweriyeke ku zêdetirî 60 salî ji aliyê mala Esed ve hate birêvebirin. Di 8’ê Kanûna 2024’an de ev sîstem ji binî de ji holê rabû û hêzên HTŞ’ê hate ser serweriyê. Ev yek jî qonaxeke nû ji bo hemû gel û dîroka Sûriyê re ye. Em wekî Partiya Sûriye Pêşeroj em dibînin ku bi rastî kesên ku wê di pêşeroja Sûriyê de cih bigrin divê sîstemeke nû demoratîk, Cumhuriyeteke demokratîk nenavendî bide avakirin. Ger ev yek nehat pêkanîn wê tu cudahî ne di sîstem ne jî di pêşeroja Sûriyê de bê avakirin. HTŞ’ê bi rêveberiya Colanî ku niha xwe weke Serokkomarê Sûriyê îlankiriye. Êdî jê tê xwestin ku hemû civakan û pêkhateyan di nava hev de qebûl bike û sîstemekî nû nenavendî bide avakirin. Ji ber vê yekê em weke Partiya Sûriye Pêşeroj jî ji bo birastî em bikaribin çareseriyekê ji hemû Sûriyê re bibînin, kar û xebatên girîng dimeşînin”.

### Kujer dibin rêveber

Zelal diyar kir ku bi zihniyeta DAÎŞ’ê sîstemeke wekhev nayê avakirin û got: “Em nikarin înkar bikin ku Colanî li ser çi zihniyetê hatiye mezinkirin. Zihniyeteke cîhadî, zihniyeteke DAÎŞ’î ye ku her kes dizane Ehmed El Şeri girydayî rêxistina El Qayîde bû. Ev kes wê çawa karibe di Sûriyê de sîstemeke wekhev ku tê de rola jinê hebe avabike! Helbet ev yek wê ne mumkîn be ji ber me dît jî çawa nîz jinê dibin. Di heman demê de kujerê şehîd Hevrîn Xelef Ebu Şeqre li ser sehneyê pêşiya her kesî kiriye wezîr. Yanî di sîstemekê de qatil û kujerên şehêdîn me, siyasetmedar û gelê me îro hatine ku vî welatî bi rêve bibin. Helbet ev yek bi vê şêwazî nayê qebûlkirin”.

### Divê jinên Sûriyê bibin yek

Zelal ragihand ku divê jinên Sûriyê li hember vê pêvajoyê bibin yek û wiha domand: “Tiştê ku niha di Sûriyê de tê kirin divê neyê qebûlkirin. Îro jin bi hemû pêkhateyên xwe yekîtiyeke xwe avabikine û Meclîsa jina Sûrî li ser vê esasê xebat dike. Em jî weke Partiya Sûriye Pêşeroj  xebatekî mezin didin meşandin. ji xwe di têkoşîna me ya azadiyê de yek azadiya jin e û rizgarkirine civakê ye. Herwiha armanca me avakriina welatekî ku tê de îradeya her kesî her rengî û her netewekê parastî be ye. Ne ku em welatekî tê de îradeya jin bê înkarkirin, ne ku em vegerin zihniyeta ku jin derveyî mala xwe tu mafê wê nîn e. helbert piştî ewqas têkoşîn û veguhartinan jin nema qebûl dike ku vegere beriya 1400 sal ku bi heman zihniyetê niha jî jiyan bike. li ser wê bingehê divê li hember vê pêvajoyê hemû jinên Sûriyê bibim yek û bi sîstemeke wekhev, demokrat tê de maf û îradeya jinê parstî be bang bikin Tiştê erînî ya ku derketiye jî serîrakirina hin jinan di vê pêvajoyê de bû ku bi rastî nerazîbûna wan li hember vê sîstemê derket. Ev yek jî nîşan da ku sîstemeke hatiye ser serweriyê nakeve xizmeta misogerkirina mafê jin û ya avakirina sîstemeke demokratî”.

### Partiya Sûriye Pêşeroj di hemû Sûriyê de xebatê xwe dide meşandin

Zelal Ceger di dawiyê de diyar kir ku di pêvajoya nû ya Sûriyê de xebatên xwe di hemû Sûriyê de didin rûnişkandin û wiha got: “Heyanî niha rengê ku ji sîstema nû derketiye pêş, ew jî yek reng, yek netew ku tê de mafê tu kesî nîn e ye. Lê tişta ku em armanc dikin û li ser wê esasê xebat dikin. Avakirina Sûriyeke nenavendî tê de mafê hemû gelan û netewan parastî be ye. helbet di vê pêvajoyê de gelek xebatên me yên girîng di hemû Sûriyê de hatin meşandin wek Heleb, Şam, Derea, Siwêda, Lazqiyê, Humis, hemayê di heman demê de li tavahê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine meşandin. Mijara me ya sereke jî rola jin di pêvajoya siyasî a nû de ku çawa dikare rol bilîze ye. Herwiha girêngiya hebûna Partiya Sûriye Pêşeroj di Sûriyê de ye”.

## Ji Pênûsa Jin

### Berê jinê didin mirinê

Nehîr Pale

Mêr di her nêzîkatiyeke xwe ya ji jinê re hewl dide ku sûdwerbigire û çi ji jinê were ne girîng e. Ji mafên xwe dibîne ku her tiştî bike û dikare jin, zarok, ciwan û her kesî bike qurbanê xwe. Di civaka zayendperest de her tim hewl tê dayîn ku hemû kêmaniyên mêr bi jinê îzah bikin. Çima ev nêzîkatî ji jinê re têne kirin? Civaka zayendperest li gorî pîvanên xwe li jinê dinêre, jin çiqasî bê qisûr bin wê tiştekî pêve bikin da ku nêzîkatiyên xwe ji jinê re rewa bikin.

Heqîqeta nêzîkatiyên ji jinê re li ber çav e. Jin gihandine asta êdî ew bixwe pir jinî, tûndiya li ser jin û zewaca zarokan rewa dibînin û li hemberî wê bê bertek bimîn in. Meclisên Kombûna Jin a Zenûbiya têdikoşin da ku jin ji qeyd û zincîrên koletiyê rizgar bibin û ji bo hebûn û rûmeta xwe dest bi têkoşînê bikin. Li beramberî vê yekê jin bertekên neyînî nîşan didin. Çima rêbazên civaka zayendperest têne lêpirsîn kirin, bertekên neyînî ji jinan bi xwe derdikev in. Jin qebûlnakin ku pir jinî û zewaca zarokan rabe. Gelek jin pir jinî ji pirsgirêkên xwe û hevjînê xwe re çareserî dibînin, ji bo ji mêr xilas bibin ew bixwe hevjînê xwe cara duyem, siyem û hwd. dizewicîn in. Ji vê mînakê tê fêmkirin ku jin bi temamî hêviyên xwe ji jiyanê qut kirine û her tim li benda mirinê ne.

Her wiha rêbazê pir zewacî ji bo terbiyekirina jinê tê bikar anîn. Ji mêr zêdetir jin vî rêbazî li hemberî hevdû didin bikar anîn. Eger jin ji hevdû heznekin, di navbera wan de pirsgirêk hebin ji bo hevdû terbiye bikin an jî tola xwe ji hevdû rabikin, mêr ji carekê zêdetir dizewicîn in. Ev rêbazên ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî têne bikar anîn dibin sedema pirsgirêk mezin bibin.

Çawa asayî bûye ku mêr ji carekê zêdetir bizewice, zewaca jin a li ser hewiyê jî asayî ye. Keçên ciwan hîna temenê wan nebûye 18 salî diçin ser hewiyê. Ji xwe hilweşandina têkiliyên jin û mêr ne pirsgirêke û berdan gelekî zêde ye. Mêr hene ku salê carekê dizewicin, eger hevjînên wî bibin 4 wê êdî hinek ji wane berde heyanî ku bikarbe dîsa bizewicê. Gelek mêr hene ku zêdetirî 10 caran zewicî ne, hejmara zarokên wan dighêje 50 zarokî û civak tiştekî ji wan re nabêje.

Civaka ku xwe birêxistin neke, her tişt li gel wan asayî be wê her tim mehkûmî cehaletê bin. Bi taybet eger hemû rêbaz û nêzîkatiyên ji jinê re asayî werin dîtin, ew civak wê nikaribe xwe ji cehaletê rizgar bike yan jî pirsgirêkên xwe çareser bikin. Keçên ciwan hîna sal li ser zewaca wan re derbas nebûye ji ber nikarin wate bidin pirsgirêkên di navbera jin û mêr de dawî li jiyana xwe tînin. Hêza wan nîne ku pirsgirêkan çareser bikin û derdor wan tîne rewşa çareseriyê di mirine de bibîn in. Civak berê wan dide mirinê, ne ew mirinê hildibijêrin.



# ‘Armanca me pêşxistina çand û hunerê di nava civakê de ye’

Rêvebera Koma Şehîd Elfetiriya ya bajarê Dêrikê Zîlan Sîda diyar kir ku kar û xebatên wan di asteke baş de têne meşandin û got, “Koma me ji bo 8’ê Adarê û  Newrozê amadekariyên xwe dike, me di destpêkê de hazirtiya roja 8’ê Adarê kiriye û me pênc stran ji bo wê rojê amede kirine.”

**Dîlan Mulhim\ Qamişlo**

Koma Şehîd Elfetiriya yek ji komên muzîkê ye û girêdayî Hîlala Zêrîn e, koma Şehîd Elfetiriya li bajarê Dêrikê ye. Herwiha ev zêdetirî 2 salane fêrî bikaranîna amûrên muzîkê yên wekî tembûr, gîtar û erbane dibin, li ser deng û awazan gelek kesan perwerde dîtine. Perwerdeya xwe jî bi stranên gelerî, dengbêjî û nûjen jiyanî kirine. Heta niha 40 stranên gelerî û hunermendên Kurd ên weke Eyşe Şan, Aram Dîkran kom kirine û heta niha di şahî û çalakiyan de ji bilî gotin, stranên gelerî, Koma Eleftirya li ser nivîsandina gotinên stranan û awazan jî kar meşandine. Di heman demê de heta niha 2 sitran çêkirine. Strana yekemîn bi navê “Xeml û Xêza Kurdistanê” hatiye çêkirin û behsa bedewiya Kurdistanê dike. Strana duyemîn jî li ser berxwedana gerîlayên azadiya Kurdistanê bi navê “Gurzê Gerîla” hatiye amadekirin.

Zîlan Sîda hem dayîke û hem jî kar û xebatên çandê birêvedibe, ji ber ku hezkirina wê ji karê çand û hunerê re heye, kar û xebatên çandê dide meşandin. Herwiha di derbarê kar û xebatên koma Şehîd Elfetiriya Rêvebera Koma



Şehîd Elfetiriya a bajarê Dêrikê Zîlan Sîda ji Rojnameya me re axaivî.

### Kar û xebatên koma Şehîd Elfetiriya

Zîlan Sîda anî ziman ku kar û xebatên koma Şehîd Elfetiriya di asteke baş de tên meşandin û wiha got: “ Em bi koma xwe derbasî gelek bajarên Rojava bûne û me gelek stranên xwe pêşkêş kirine. Em tevlî gelek şahî û festîvalan bûne yek ji wan jî festîvala orkêş bû û me gelek stranên xwe têde pêşkêş kirin. Dema ku çalakiyên girêdayî jinê çêdibin em tevlî dibin, herwiha koma me di vê demê de bandoreke mezin li civakê kirye, ji ber ku jin divê  demê de hemû bend û qeydên civaka paşverû şikandiye û jin îro li beramberî hezaran mirov bi deng û rengê xwe derdikeve li ser dikê. Em weke jin dixwazin ku em bi xwe, xwe



rêvebibin û civaka xwe  pêş bixin. Di heman demê de êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser gelê me û bi taybet hunermendan nikare coş û hêza me bişkîne û em ê, li ser xeta şehîdan têkoşîn û berxwedaniyê berdewam bikin. Em hêza xwe ji şervanên di çepêrên şer de û şehîdên azadiyê digirin.”

### Pirojeyên dema pêş

Rêvebera Koma Şehîd Elfetiriya ya bajarê Dêrikê Zîlan Sîda da zanîn ku hazirtiyên wan ji bo 8 ’ê Adarê û Newrozê hene û wiha bi dawî kir: “ Em weke koma Şehîd Eleftiriya bi coşeke mezin dest bi amedakariyan ji bo 8’ê Adarê û Newrozê kiriye, di destpêkê de em hazirtiya 8’ê Adarê dikin û me pênc stran ji bo wê rojê amadekirine. Herwiha kom ji 8 endaman pêktê û hemû jî bi rengekî aktîf tevlî kar û xebatê dibin. Em weke jin bi xwe li amûran dixin û stranên xwe dibêjin. Di heman demê de em hêza xwe ji şervanên di çeperên şer de digirin û bi hêz û coşa wan emê 8’ê Adarê û Newrozê pîrok bikin. Astengiyên li pêşiya karê me derdikevin ew jî kêmbûna amûrê muzîkê ye, lê em hewldidin ku ev astengî nemînin û armanca me ji vî karî pêşxistina çand û hunerê di nava civakê de ye.”

# ‘Wênesazî cîhaneke cûda ye’

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Wênesaza jin Nûrhîn El-Hisên diyar kir ku wênesazî cîhaneke cûdaye ku ji zarokatiyê ve bi wê re mezin bûye. Tabloyan xêz dike bi armanca ravekirina êş û azarên gelê xwe.**

Nûrhîn El-Hisên di sala 1999’an de li bajarê Serêkaniyê ji dayik bûye. Wê zarokatiya xwe li bajarê xwe derbas kiriye lê ji destpêka kirîza Sûrî ve hemû bîranînên xwe li şûn xwe hiştin û berê xwe dan bajarê Qamişlo. Her wiha ev nîzî 6 mehên wê ye ku li Holenda dijî. Di derbarê jiyan, kar û xebatên wênesaza jin Nûrhîn El- Hisên ji Rojnameya me re axivî.




### Kar û xebatên Nûrîn El-Hisên

Nûrhîn El-Hisên da zanîn ku wê ji zarokatiya xwe ve ji wênesaziyê hez dikir û hertim ji bo xwe tablo xêzdikirin û wiha got: “Ji ber şert û mercên jiyanê derfet nebû ku ez xwendina xwe berdewam bikim, lewma min biryar da ku ez dest bi karê wênesaziyê bikim. Malbata min û hevalên min hertim destek û hêviyê didan min da ku ez vê riyê berdewam bikim. Min di sala 2016’an de li peymangiha wênesaziyê dest bi pêşxistina xwe kir, ez li Enstîtoya Hunerê ya Malva mamosteya xêzkirinê bûm. Her wiha rahênera xêzkirinê li Hîlala Zêrîn jî bûm. Di heman demê de ez di hundir û derveyê Rojava beşdarî 26 pêşengehan bûm; li Helebce, Silêmaniyê, Heftemîn Festîvala Wêje û Hunerê ya Jinan li Qamîşlo, Şeşemîn Forima Rojava ya Hunerên Bedew li Qamişlo, Sempozyûm di qatekê de, Sempozyûm li Kobanî, festîvala Perçem li Kobanê, Xecxecok Qamişlo û Pêşengeheke hunera plastîk bi navê “Şehîd Xalid” bûme. Heya roja îro ez rastî wan astengiyên giran nehatime ji ber ku ev riya ku min hilbijartî bi xwesteka min e û gava tiştek bi xwesteka mirov bê, wê helbet hemû hêza xwe bikar bîne.”


### ‘Huner jiyaneke xwezayî ye’

Wênesaza jin Nûrhîn El-Hisên axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: “Huner jiyaneke xwezayî ye, ez hemû hestên xwe têde derdixim holê û dema ku ez xêz dikim hertim hîs dikim ku li cîhaneke cûda me. Hertim ez dixwazim bi riya firçe û rengan hunera kurdî ronî bikim. Tabloyên min herî zêde



neyênika kurdayetiyê îfade dike wek; Dayîkên şehîdan, Leşkerên kurd û Jina bi hêz li Rojavayê Kurdistanê. Hêviya min ewe ku di demên pêş de tabloyên xwe li tevahî Ewrûpayê nîşan bidim û bi tabloyên xwe yên kurdî û navê xwe bêm naskirin. Banga min ji hemû jinan re ew e ku ji talenta xwe sûd werbigirin, hebûna civaka xwe biparêzin û xwe pêş bixin. Da ku xewnên xwe bi cih bînin û di heman demê de ji bona parastina şaristanî û hebûna civakê.

## Têbînî



### Dema Ku Rewşenbîr Rêya Xwe Winda Dikin

Kemal Necim

ji roja ku rejîma Baas li Sûryeyê hilweşiyaye, li nava civaka Kurdn ya li Rojava liv û tevgereke nû destpê kiriye. Di hêla siyasî de diyar e ku dê liveke çawa çêbibe, tevgera siyasî hin kar û barên ku bi salan amadekarî jêre nekiribûn, niha hewl didin pêk bînin. Ji wan karan jî yek jê mijara yekrêziya tevgera siyasî ya kurdî ye. Lê li hêleke din de jî liv û tevgerek çêbûye, ew jî ew e ku çîna rewşenbîran ji nişkave li xwe hayîl bûye ku ketiye pêşberî rewşeke nû, êdî ew jî li xwe digere û pirsa cih û rola xwe dike. Lê heta niha tişta ku diyar e, rewşenbîr lêgerîneke şaş dikin û li cihekî ku ne warê wan e digerin, lewma zû bi ser xwe ve û bi ser rola xwe û erk û delmetên xwe ve nabin.

Dema ku em dibêjin lêgerîneke şaş dikin, mebesta me ew e ku kom û sazî û yekîtiyên rewşenbîran, di bin bandora arîşe û nakokiyên siyasî yên di nava tevgera siyasî de, ew jî diçin heman gotarê dibêjin û bi şev û roj behsa yekîtiya tevgera rewşenbîrî dikin, tevî ku pirbûna saziyên rewşenbîrî ne rûdaneke mîna pirbûna partiyên siyasî ye, lewma pirsgirêk û arîşeya tevgera rewşenbîrî ne heman arîşeya tevgera siyasî ye û yekirina tevgera rewşenbîrî dê nebe nimûne ji partiyên siyasî re. Lê xuyaye ku rewşenbîr li şûna ku li qad û meydana xwe têbikoşin û rola xwe bibînin û erk û delametên xwe pêk bînin, hewl didin kirasê siyasetmedaran li xwe bikin û li şûna tevgera siyasî bixebitin.

Diyar e ku erk û delametên saziyên rewşebîrî pêşxistin, geşkirin û parastina çand û wêje û kelpûr û ramanê ye, her wiha birêvebirina kar û barên kesên ku bi van mijaran mijûl in. Eger ev sazî van erkan pêk tînin û qada afrêneriyê û behremendiyê fereh dikin, asta wêje û çandê bilind dikin, wê çaxê mirov dikare bêje ku pirbûna saziyên rewşenbîrî jî ne pirsgirêk û arîşeyeke mezin e, berovajî wê dibe ku bibe egera pêşketin û geşkirina qada çand û wêjeyê.

Li gorî van boçûnan li şûna ku rewşenbîr li devereke din li xwe û rol û erkên xwe bigere, divê li qada xwe ya rewşenbîrî bigere û zanibe ka li gorî vê pêvajoyê çi jê tê xwesin.

Berî her tiştî divê rewşenbîr zanibe ku hebûna civaka kurdan bi hebûna çand, ziman, kelepor, wêje û ramanê wê civakê ye, eger çand û wêje û ziman û dîrok ji dest here hezar partî jî bibin yek wê gelê Kurd ji tinebûnê rizgar neke. Stûnên hebûna Kurdan weke gel û civak li ber metisriya têkçûnê ne. Li gorî ezmûna dîrokî hêzên desthilatdar dê her tim hewil bibin ku van sitûnên hebûnê hilweşînin. Lewma ji kesayet û saziyên rewşenbîr, wêjevan û afrêneran tê xwestin ku guh bidin nirxên çandî û wêjeyî yên kurdayetiya resen. Divê civaka Kurd têr û tijiyê çanda xwe, zimanê xwe û wêjeya xwe bibe, ji bo vê jî divê hilbirîn û afrandineke domdar, nûjen û bi bandor hebe, ango divê ku qada çand û wêjeya kurdî her tim di nava geşepêdan, guherîn û nûjeniyê de be.

# ‘Min du zarokên xwe dane lê dîsa jî deyndara Rêber Apo me’

Dayik û xwişka şehîdan Suad Miſtafa ku di sala 1995’an li Şamê çûye cem Rêber Apo, heta niha bi wê soza xwe tevdigere û xebateke pîroz ji bo azadiya Kurdiſtanê dide meşandin. Dayika Sûda wiha dibêje; “ Min du zarokên xwe daye, lê ez dîsa deyndarê Rêber Apo me.”

**Amara Baran/ Dêrik**

Di derbarê hevdîtina bi Rêber Apo re, naskirina wê ji Tevgera Azadiyê re û xebatên wê yên di wê çarçoveyê de, Suad Mistefa bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**-Wekî jineke kurd wa çawa Tevgera Azadiyê naskir?**

Mîn di salên 80’î de tevgera PKK bi wesîleya birayê xwe naskir, malbata min bi giştî tevger naskirin. Dema ez biçûkbûm carekê bi birayê xwe re îûm civînekê, li wir gelek heval hebûn û di nava wan de jî fermandarê nemir Masûm Korkamaz bû. Min yeke car dît ku li wir herkes ji hev re dibêje heavl ez matmayî mam. Di dema em ji wir derketin û ber bi malê ve birêketin, min ji birayê xwe pirsî, çima navê tevahiya kesên li wir heval e. Birayê min ji min re got navê min jî heval e. Dema gihiştim malê min ji diya xwe re got, em li deverekê bûn ku navê tevahiya kesên li wir heval e.
Birayê min rabû ser xwe û got, erê navê min jî hevalê. Wisa destpêka naskirina min ji tevgera azadiyê re bû.

**-Yekem car dema te Rêber Apo dît tişta ku herê zêde li ser te bandorkir çi bû?**

Di sala 1995’an de bi şehadeta birayê min, di malbatêde 8 şehîd çêbûn. Li ser daxwaza Rêber em nêzî 50 hezar kes ji bo pîrozbahiya 15’ê Tebaxê derbasî akademîya Mahsûm Korkmaz bûn. Dem gel Rêber Apo dît ew pir bi coş û heycan bû. Rêber Apo di destpêkê de wiha got: “Em nêzî 40,50 hezar kes li vir kombûne, lê mixabin em li ser axa xelkê ne. Ger em li ser axa xwe bana wê hîn xweştirbûya.”. Ev axaftina Rêber Apo pir bandor li min kir û min soz da xwe ku êdî ezê bar bigrim ser milê xwe da ku em 15’ê Tebaxê li axa xwe pîroz bikin. Rêber Apo heta seat 2 şevî ji me re axivî.
Dema mele Evdirehman diaxivî ez li wir bûm, wî wiha got, “Ez li hember Rêber Apo wekî noqteyekê di behrê de me.” Rêber Apo danî ser pişta wî û wiha got, “Niha kaelek mîna ciwanekî diaxive.”. Sibha roja din em careke din çûn û me silav da Rêber Apo. Min jê re got, “Ez tiştekî naxwazim, tenê dixwazim heta dawîya emrê xwe li pê doz u meşa te bim.

**-Ew gotina Şehîd Egîd (Mahsûm Korkmaz ) çi bû u çawe bandor li te kir?**

Her gotina hevalê Egîd dihat bîramin em li tirêna ewil serketin heta ya dawîyê jî emê bibînin. Herwiha digot em ê siya dijmin jî li ser axa xwe nehêlin, van gotinên wî pir bandor li min kir.
Dema birayê min yê piçûk şehîd bû min sozek da birayê xwe û got, “Ez ê her li ser şopa te meşim û çi zarokêmin hebin jî wê bikevin ser rêya te û ez nebêjim wan vegerin, ezê piştgirîyê bidimê .
Dema Rêber Apo hat dîlgirtin ez pir hejiyam, ez ketim, wê rojê dema min çavê xwe vekir ez li nexweşxanêbûm û dema hatim ser hişê xwe ez rabûm û min got,”Gereke ez zêdetir bixebitim , çi kar hebe ez bidim ser milê xwe.

**Dema ku Komploya Navnetewî a li dijî Rêber Apo çêbû, çi bandor li te bû?**

Dema Rêber Apo hat dîlgirtin ji kerbê wê hêrsê re min stranek çêkir li ser Rêber Apo, ez nikarim bînim ziman ez çiqasî gîrêdayî Rêber Apo me.
Dema hat dîlgirtin min got, “Heta Rêber Apo azad nebe ez jî cilê reş ji xwe danaynim.”
Ev 43 sale bê navber ez di nava şoreşê de me û ti caran poşman jî nebim. Ruxmê temenê xwe jî ez xwe ji bo kar û şoreşê jî nadim paş. Ji ber ez dibejlm temenê min her tim 15 sale, li navendê jî ez karê xwe bi keyfxweşî dikim. Dema birayê min ji mal çû got tiştek ne ji bo berjewaendîyê partîyê be pêwîste li hember wê bisekînî min ji xwere wekê pîvan girtîye ev yek û heta niha tiştek dijî PKK were axaftin ez li hember disekinim .
Ez her carê lavan dikim ku ez layiqê şehîdan bim, layiqê serokatî bim. Banga min destpêkê ji bo min û tevahî cîhanê û jinên berxwedêre ji bo hemû kesên welatparêz re ku em heta Rêber Apo fîzîkî azad nekin em nesekinin, em ê timî di



nava çalakî û berxwedaniyê de bin, xwedî li bendava Tişrînê em ê derbikevin.

**Di dawiyê we bangawaziya we çi ye?**

Pêwîste em ava xwe, axa xwe û kehrebaya xwe biparêzin. Ji herdemê zêdetir pêwîste em li erkê xwe xwedî derbikevin û destkeftîyên xwe biparêzin. Herwiha em kujerên mirovan yên wekî rayedar di desthilata Şamê ya nû de ne, qebûl nekin.
Divê em wekê kurd bi rengê xwe di nav Sûrîyê bin, ji bilî wê em qebûl nqkin.
Pêwîste kurd yekîtîya xwe çêbikin û bi hevre pêkhateyên Sûriyê, axa xwe biparêzin. Divê em gelê kurd bi hevre xwedî li Kurdistana xwe derbikevin.

# ‘Gazî şehîdên nemir in’

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

**Gaziyên şer Arîn Koçer û Zîlan Hesekê anîn li ser ziman ku Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrîk pêşengên jinên azad bûn û tevî astengiyên xwe jî xebatên şoreşê nîvcoyî nehiştin û wiha gotin: “Navê gazîtiyê pîroz e û em ê layiq bibin.”**

Di ser şehadeta her du rêveberên Federasyona Gaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (FGBRS) Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrik re salek bihurî. 11’ Sibata 2024’an dewleta Tirk a dagirker êrîş bir ser navenda Federasyona Gaziyan a li Qamişlo. Di wê êrîşê de ji rêveberên federasyonê Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrik şehîd bûn.
Bi wesîleya salvegera şehadeta pêşengên azadiyê, rêveberên Federasyona Gaziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (FGBRS) Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrik rêhevalên wan û gaziyên şer Zîlan Hesekê û Arîn Koçer ji rojnameya me re axivîn.

**‘Em ê teqez tola hevalên xwe rakin’**



Gaziya şer Zîlan Hesekê diyar kir ku di aliyê sekn, helwest û biryardariyê de, taybetmendiyên şehîd Sorxwîn û şehîd Azadî mîna hev bûn û wiha domand: “Hem qîmet didan hev hem jî didan hevalên xwe. Heval û xwedawenda me Sorxwîn gelekî bi sebir bû. Bi taybet jî li hemberî hevalên gazî xwedî sebreke zêde bû. Bi saetan dikarî li hevalan guhdar bike û bi wan re sohbet bike. Heval Sorxwîn di berxwedana Kobanê de çavekî xwe winda kiribû. Nayê bîra min ku heval Sorxwîn gotiye ez westiya me, yan jî ez nexweşim. Di aliyê sekn, helwest û biryardariyê de taybetmendiyên şehîd Sorxwîn û şehîd Azadî hema hema mîna hev bûn. Dema heval Sorxwîn li Kobanê bû ew û heval Azadî di heman xebatê de bûn. Hem qîmet didan hev hem jî qîmet û nirx didan hevalên xwe. Bi rastî mirov heyrana hevaltiya wan bû. Şehadeta her du hevalan ji bo me pir giran bû. Ez heval Sorxwîn û heval Azadî bi rêzdarî bi bîr tînim û li hemberî bîranîna wan bejna xwe ditewînim. Em ê ala wan timî bilind û tola wan rakin. Em ê welatekî azad û wekhev ê şehîdên me di oxira wê de canê dane, ava bikin.”

**‘Her du hevalan jî astengiyên xwe dikirin berhama şoreşê’**

Di heman çarçoveyê de Arîn Koçer da xuyakirin ku fermandar Sorxwîn ti caran gazitî ji xwe re nedikir asteng û wiha da diyarkirin: “Dema min ew dît û nas kir, ketim nav kelecaneke mezin. Heval Sorxwîn xwe da nasîn û got, ‘Ez di rêveberiya hevalên gazî de cih digirim.’ Hema bala min kişand, min pêre sohbet kir û kêfa min pir jêre hat. Dema qala jiyana hevalên gazî dikir, bi kêfxweşî û kelecan behs dikir. Heval Sorxwîn tevî gazî bû jî qet û qet rojekê jî neanî ser ziman û negot, “Ez jî gazî me.” Timî gurûgeş û pir biçalak bû. Dixwest weke heval, hevrê û rêveberekê, karê xwe pir baş bike. Ji bo min her cihê hurmet û hezkirinê ye. Pir dilnizm û xwezayî bû. Wê her tim heval û fermandara me ya delal û bedew be. Di cewherê hemû gotin û nîqaşên wê de Rêber Apo hebû. Dilsoziya wê ya bi Rêbertiyê re pir kûr bû. Weke jinek ji Rojhilatê Kurdistanê pêşengtî ji jinan re dikir. Nîqaşên wê her tim li ser azadiya jinê bû. Bi nîqaşên xwe mirov bandor dikir. Bi taybetî jî di nava gel û civakê de pir zêde dihat hezkirin. Ji ber êşa gelê xwe ji kûr ve his dikir. Ji gel re civîn çêdikir û bi wan re mijûl dibû.”

**‘Azadî dilsoza Rêbertî û hevrêyên xwe bû’**

Arîn Koçer hevrêyên xwe yên gazî Sorxwîn Rojhilat û Azadî Dêrîk bibîranî û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Heval Azadî dilsoza Rêbertî û hevrêyên xwe bû. Bi dil û can di nav kar û xebatên gaziyan de cih digirt. Nêzîkatiyên wê yên ji gaziyan re li ser esasê hevrêtiya Apoyî bû. Ez jî weke şagirteke fermandar Sorxwîn û şopdara rêya wê, bi vê mebestê soz didim û dibêjim, ‘Ez ê li ser şop û rêya wê xwe pêş bixim û têkoşîn bikim.’ Bi taybet tişta ji qehreman Sorxwîn fêre bûme ew bû ku divê jin ji xwe bawer û têkoşer be. Dema hevalek diket nav zehmetiyan bi hemû derfetên xwe pêre dibû alîkar, ew îqna dikir û pirsgirêk çareser dikir. Di pêvajoya ku keça mamê min şehîd bû de, hevala Sorxwîn hate serdana min û bi min re mijûl bû. Wê demê ez jî gelekî bandor bibûm. Ev heval xwedawendê azadiyê bûn. Em wan hevalan bibîrtinin û em ê mîrateya wan bighînin serkeftinê.”



# Roja Reş wê veguhere Roja Azadiya Gelan...

Komploya Navneteweyî ya ku 9’ê Cotmeha 1998’an di şexsê mîmarê Şoreşa Kurdiſtanê Abdullah Ocalan de li dijî gelê kurd hat deſtpêkirin û di 15’ê Sibata 1999’an de Rêber Apo hate revandin û radeſtî dewleta Tirk hate kirin. Ev 26 sal in di şexsê Rêber Apo de qirkirina gelê kurd tê armanckirin.Lê li hemberî Komployê berxwedana gelê kurd û tevgera azadiyê nerawestiyaye û heyanî ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêkwere wê têkoşîn her berdewam be.

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Di sal 1978’de Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) weke balendeya Hîma ji nava xwelîya dîrokê afiriye û bi xwe re vejîna welatekî û gelekî ku ber bi tunebûne ve diçû anîye. Ji sala 1984’an û şûn de, PKK’ê bi şerê çekdarî bersiva komplogerên Lozanê û artêşa duyem a di NATO`yê de (artêşa Tirkiyê ) daye ku êdî PKK’ê û gel hesabê dîrokî ji dagirkerên Kurdistanê dixwaze. Li hember şoreşa Tevgera Azadiyê, dewleta Tirk a xwedî ezmûnek mezin di têkbirina şoreşên kurdan de ye, hemû rêbaz, derfetên leşkerî û aborî xistine meriyetê, şerekî hebûn û nebûnê him PKK û him jî dewleta Tirk dane meşandin, ne tunekirina hezaran welatparêz, rewşenbîr û têkoşeran; ne jî şewitandin, valakirin û wêrankirina hezarên gundên Kurdistanê, dikarîbûn şoreşa PKK’ê rawestîne yan jî lawaz bikin. Serokwezîrên Tirkiyê yên mîna Tansû Çîler, Mesûd Yilmaz û di pey wan re jî Tirgût Ozal gihiştine wê baweriyê ku êdî bixwazin nexwazin bêyî çareserkirina doza Kurdî wê Tirkiye bi aramî jiyan neke. Ji xwe serokê Tirkiyê Tirgût Ozal hewl dabû ku pêvajoya çareserkirinê bide destpêkirin, lê belê di rewşeke ne dîyar de, Tirkiyê mirina Ozal 1993’de ragihandiye. Êdî dûbare Tirkiyê li hember doza Kurdî û PKK siyaseta qirkirinê daye meşandin, di sala 1996 de hewldana siwîqastê li ser Rêber APO li Şamê hate kirin, lê di vê planê de bi ser neketin, ta di 15’ê Sibata 1999’an de bi komployeke navneteweyî Rêberê gelan Rêber Apo dîl hate girtin.

**Pêvajoya Kkomploya Navneteweyî**

Rêber APO derbarê komploya 9’ê Cotmehê de wiha gotiye:”Ez dibînim ku komploya navneteweyî ya ku di 15’ê Sibata 1999’an de min anîn Tirkiyê, yek ji bûyerên herî girîng di kevneşopiya komploger a desthilata serdest de ye.”
Di çarçoveyeke ji lîstikên siyasî û berjewendiyên aborî de, li gel gelek îxanet, tundî û xapandinê de, komploya navneteweyî hatiye meşandin ku her çar parzemînan di komployê de cih girtiye. Serokwezîrê Tirkîyê yê wê demê Bûlent Ecevît bi xwe diyar kir ku CIA ya DYA di dîlgirtina Rêber APO de roleke sereke lîstiye, ji bilî wê, Silêman Demîrel, serokê MÎT’ê yê wê demê, Şenkal Atasakon û rayedarên din ên artêşa Tirk a dagirker ti kesî li Tirkiyê bi revandina Rêber APO ya bi şêwazê nemerdane bê agahî bûn. Ecevîd dixwaze bêje ku serkeftin a wan e, çalakî ya wan e û bi tenê DYA alîkar bû! Bêyî ku bêje lîstikvanê sereke DYA û Israîl bûn, tenê Tirkiye li benda encamê bû, ew bi xwe jî matmayî bû ku Rêber APO gihiştiye Tirkiyê.
Rêber APO di destpêkê de berê xwe ji Sûriyê daye Îtalyayê, di pey re berê xwe daye Rûsya, dubare vegeriyaye Yewnanistanê û dawî jî berê xwe daye Kenyayê ku li wir komplo bi encam bûye. Tirajîdiyeke ku ji 9’ê Mijdara 1998’an û ta 15’ê Sibata 1999’an de Rêber APO ji ezmanê welatekî diçû ezmanê welatekî din, êdî cîhan pir teng bibû û ti welatan nikarîbû wî hembêz bike, serkêşên cîhana sermayedar Amerîka, Ingilîstan û Israîlê biryara tunekirina nirxên mirovahiyê dabûn, ango biryara tunekirina Rêber Apo dabûn ji ber ku neketibû bin baskên wan û pergala wan nepejirand û ji xeta azadiya gelên Rojhilata Navîn derneket.
Ji 1996’an ve plana komployê






hatibû dayîn û bazirganî li ser Rêber Apo hatibû kirin, ew jî dema ku serokê DYA Bil Cilinton û serokwezîrê Yewnanistanê Kostas Sîmîtîs li hev civîyabûn, êdî di 9’ê Cotmeha 1998’an de Sûriyê ji hêla NATO û DYA ve ketiye nava dorpêçeke giran de. Wê demê jî Sûriyê demildest ji Rêber Apo dixwaze ku ji axa Sûriyê derkeve, ji xwe Rêber Apo xewn û xeyalên wî ew bûn ku di bejna çîyayê Kurdistanê de cihê xwe di nava gerîlayên azadîyê de bigre, lê belê ji bo pêşxistina aştiyê berê xwe dide Ewropayê. Sozên ku ji Yyewnanistanê girtibûn ku êdî wê pêşwaziya wî bikin û wî bi cih bikin, nerast derketin, ew vexwendina ku qaşo Yewnanistanê ji bo Rêber Apo re kiribû ji planên istixbarata Ingilîstanê bû ku Rêber Apo ji Sûriyê derxînin û têxin xefka Yewnanistanê. Ji xwe di 9’ê Cotmehê de berê Rêber Apo dane ber bi Mosko ve, alîkarê serokwezîrê Tirkiyê yê wê demê Mesût Yilmaz di 11’ê Cotmeha 1998’de civîneke çapemenîyê li ser mijarê li dar xist û got: ”Bi saya agahiya ku rêxistina istixbaratî ya welatekî hevalbendê me, me pê zanî ku Apo li Rûsyayê ye”, Tevî ku Domaya Rûsî bi 298 dengan mafê penaberîyê ji bo Rêber APO pejirandine jî, lê belê serokwezîrê Rûsyayê Buris Yitisin biryara Domayê qebûl nekiribû û daxwaza Amerîka ya ji bo radestkirin an jî derxistina Rêbertî ji Rûsîyayê pejirand. Êdî ji Rêber Apo hatiye xwestin ku ji Rûsyayê derkeve, ji xwe biryara Yilsin ne bê hesab bû, sûdgirtinên aborî hebûn, ango bazara firotinê hatibû kirin, êdî dubare Rêber Apo vedigere Yewnanistan û ji wir jî berê wî didin Kenyayê ku li wir di 15’ê Sibata 1999’an de bi rêbazekî hovane hate revandin.

**Komploya navnetewî hîn berdewam e**

Sedema komploya navneteweyî jî ew e ku Rêbertî bûye gerdûnî û weke şoreşeke nû ya civakî di çarçoveya PKK’ê de li Kurdistan, Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê belav bûye. Rêbertî kombûneke mezin a enerjiyê ye ku di demeke kin de dibe sedema şoreşa civakî. Ev şoreş di asta hişmendiya azadî û çanda demokratîk de bi lez û bez li cîhanê belav bû. Şoreşa sosyalîst a Demokratîk û Ekolojîk ku navenda wê azadiya jinê ye, tê wateya bidawîbûna pergala kapîtalîst. Ji bo tunekirina çavkaniya enerjiyê ya ku bû sedema vê pêvajoya şoreşgerî, bi komployek dij şoreşê û têkoşîna gelê Kurd hate plankirin. Armanca sereke ya komployê belavkirina enerjiya ku di şexsê Rêbertî de derdikeve pêş û dibe sedema zayîna gerdûnî bû. Hêzên komploger bi israr bi rêya komplo û sîstema Îmraliyê dixwestin hişmendiya xwe li ser Rêbertî ferz bikin. Xwestin Rêbertî ji gerdûnîbûnê qut bikin û di şexsê wî de têkoşîna azadiyê ya gel û mirovahiyê tasfiye bikin. Li aliyê din Rêbertî li hemberî êrîşên komployê yên tecrîd û îzolasyonê zêdetir xwe bi heqîqeta civakî û gerdûnî ve girêda. Li pişt berxwedana bêhempa ya bîrdozî û felsefî ya ku Rêbertî 26 sal in li hemberî pergala îşkenceya Îmraliyê di warê fikrî û hişmendî ve de daye meşandin, armancên civakî û erkên mezin ên exlaqî hene. Rêbertî her cure êrîşên derûnî û fizîkî yên êşkencekaran bi zêdetir xwe girtina rastiyê pûç kir. Di hemû parêznameyên xwe de hem gerdûnîbûna mirovahiyê û hem jî mafên Kurdan parast. Bi berpirsyariyeke berfireh ku azadiya xwe bi azadiya gelê xwe û mirovahiyê ve girêdide û ji bona ku ev yek pêkwere hertim di nava kar û xebatê de bû. Rastiya Rêbertiyê ya ku komplo û pergala Îmraliyê hewl da bifetisîne, veguheriye heqîqeteke gerdûnî. Herwiha li gorî prensîba exlaqî tevdigeriya û li gorî exlaqê civakî yê ku pê re dijiya û tevdigeriya û jiyan dikir. Ji bona Rêbertiyê dest ji civakê berdan dihat wateya dev ji mirovahiyê berdan bû. Mirov ancax bi civaka xwe dikare hebe. Ferdperestiya ku ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve tê ferzkirin tê wateya ji mirovahiyê dûr ketin bû. Hêzên komploger bi dewleta Tirk a dagirker re kolonyalîst û hiqûqa ferdî ya Ewropayê, bi israr xwestin Rêbertî biçûk bikin û bi ceribînin. Li hemberî siyaseta qirkirina û işkenceyê ya ku di şexsê Rêber Apo de li ser gelê Kurd tê meşandin, di serî de Rêbertî bi têkoşîn û berxwedana xwe ya bêhemba hemû planên hêzên komploger vale derxsitin. Herwiha û di serî de gelê Kurd û hemû kesên azadî xwaz bi fikir û remanê Rêber Apo bawerin û wê heyî azadiya wî ya fîzîkî pêkwere her di nava têkoşîn û berxwedanê de bin .

# ‘Yekem car e ku wê kurdên Rojava tevlî Konferansa Miyûnix bibin’

Çalakvanê kurd Yûnis Bahram yek ji kesên ku wê tevlî Konferansa Miyûnix bibe û tê de biaxive diyar kir ku yekem car e wê kurdên Rojava tevlî Konferansa Miyûnxê bibin û got, “Di Konferansa Ewlekariyê de ez ê pirsa kurdî, Rêveberiya Xweser û DAIŞ’ê gotûbêj bikim.”



**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 14’ê Sibatê de wê 61’ekemîn Konferansa München a Ewlekarya Cîhanî ya’ê ya salane li parêzgeha Miyûnxa Elmaniyê bi amadebûna serokên dewletên cîhanê, siyasetmedar, wezîr, şêwirmend, parêzer û hwd bê lirdarxistin.
Herwiha tê de jî wê gotûbêj li ser rewşa ewlekariya navnetewî, nakokî û qeyranên herêmî yên wek nakokiyên li Ukrayna, Sûdan,Venezuela, Afganistan, Gurcistan û Rojhilata Navîn, were kirin. Di heman demê de wê nirxandin li ser siberoja ewlehî, aştî, aboriya hemû dewletên ku di vê konferansê de beşdar bûne, bên kirin.



Hêjayî bibîrxstinê ye ku wê panêlek jî li ser rewşa kurdan û Rojavayê Kurdistanê jî li dar bikeve, tê de jî wê hin xalên girîng bên eşkerkirin.
Derbarê lidarxistina konferansê û panêlê, Serokê Foruma(Korbend) Elmanî- Kurdî, Yûnis Bahram ku wê panêlê bi rê ve bibe ji rojnameya me re axivî.

**‘Koneransê Miyûnix ji bo ewlekariya cîhanê tê lidarxistin’**

Bahram destnîşan kir ku konferans ji ber ewlehiya cîhanî û qutkirina destekdayîna terorê li dar dikeve û wisa got : “Konferansê Miyûnix ê Ewlekariyê bi hejmara xwe ya 61’ê wekî her car li Miyûnxê wê li dar bikeve. Ev konferans li ser asta cîhanê ye, dê bi axaftina serokkomarê Almaniyayê, Firank Valter Ştaynamayêr bê vekirin. Herwiha wê nêzî 100 kes ji serokkomar, wezîrên derve, balyozên dewletan û hwd…. di konferansê de amade bibin. Ew ji girîngtirîn konferansên ku ji bo ewlehaiya cîhanî tê lidarxistin. Yek ji xalên girîng ku wê bal li ser were kişandin jî pirsa destpêkirina terora cîhanî ya domdar e. Li aliyekî din jî mijara bingehîn şer û pevçûnên ku li Rojhilata Navîn, Okarniyê diqewimin û xala aboriya cîhanî ye. Ev konferans wê di bin durşmeya “Bes e ji bo aboriya ku terorê xwedî dike.” de bi rê ve biçe, wê Îraq, Tirkiyê, Îran û Israyîl jî bi girse amade bibe.”

**‘Yekem car e ku wê kurdên Rojava tevlî Konferansa Miyûnxê bibin’**

Yûnis da zanîn ku cara yekê ye wê kurdên Rojava di Konferansa Miyûnxê de beşdar bibin û biaxivin û wiha domand: “Heta niha car a duyemîn e ku wê gelê kurd bi navê hikumeta Başûrê Kurdistanê tevlî vê konferansê bibin, lê ji bo gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê cara yekem e ku wê tê de beşdar bibin. Bi navê parlementer û siyastetmedar ên nêzî Korbenda Almanî-Kurdî ne û ew ê konferans bi rê ve bibin, min vexwedinin konferans. Di konferanseke wiha de eger kurd tevlê dibin tê wateya ku êdî pirsa kurdî ketiye rojeva cîhanî de û ev yek gelekî ji bo me weke kurdên Rojava girîg û sûdmend e. Ez ê bi navê xwe û Korbenda Almanî-Kurdî 10 xulekan axaftinekê bibêjim. Herwiha me xwest ku Ilham Ehmed jî tevlî konferansê bibe, civînek bi kesên eleqedar re bi amadebûna heval Ilham hat lidarxistin. Heta niha em li benda vexwendinê ne, lê mixa bin hîna jî kesên peywendîdar vexwendin ji bo wê neşandine.”

**‘Wê pirsa kurdî, Rêveberiya Xweser û QSD bê vegotin’**

Serokê Foruma(Korbend) Elmanî- Kurdî, Yûnis Bahram diyar kir ku wê pirsa kurdî, sîstema Rêveberiya Xweser, Kampa Holê, çeteyên DAIŞ, berxwedaniya QSD’ê bê vegotin û wiha anî ser ziman: “Di vî konferansî de axaftineke sereke ji bo min heye ez ê 10 xulekan biaxivim. Di serî de ez ê pirsa ewlekariyê û kurdên Rojava bînim ser ziman. Li gel wê jî ez ê li ser Sîstema Rêveberiya Xweser, QSD, YPG, YPJ’ê biaxivim. Li aliyekî din ez ê li ser xala çeteyên DAIŞ’ê û Kampa Holê jî biaxivim û şêwyê çareserkirina xeteriya van kesên teror bidim xuyakirin. Herwiha eşkere bikim ku çawa herêmên xwe ji terorê parastin û berevanî di ber ewlekariya Rojhilata Navîn û Ewripa de kirin. Di herdu rojên konferansê de wê gelek panêl bên lidarxistin, ez û hin kesên din jî panêlekê bi rê ve bibin. Di destpêkê de em ê mijara pirsa kurdî li Rojhilata Navîn û wê parastina destkeftiyên kurdan çiqasî bandorê li ewlekariya Rojhilata Navîn bike. Gelek kesayetên ser asta navnetewî wê di panêla me de amade bibi, ji wan kesan jî wezîrê Karê Derve yê Israyîl û serokwezîrê wan wê amade bibin.”

# Golikê garanê û ENKS’ê

**Reşo Meydana**

Êdî her tişt aşkere bûye. PDK bi MİT’a Tirkan re hevdîtin çêdike û li gorî fermanên ji wan digirin jî tevdigere, li gorî wê ENKS dimeşîne.
Ya yekê, piştî ku li Sûriyê rejîma mala Esed hilweşiya hemû gelê Kurd û gelên Sûriyê ketibû bendewariyekê. Gel û baweriyên li Sûiyê digotin qey astengên li pêşiya azadiyên wan rabûne, ew ê di demeke kurt de şoreşa xwe bi azadî, wekhevî û demokrasiyê tacîdar bikin. Di demeke pir kurt de HTŞ’ê bi rengê xwe (bi rengê xwe yê reş) yê reş, bi zext û kuştinên xwe yê li ser Elewî, Durzî û dewlemendiyên gelên li Sûriyê nîşan da ku ne xwediyê wê niyet û hêzê ye.
Ya duyemîn, helwest yan jî ya hê rastir bê helwestiya ENKS bû. Bi taybet ji bo gelê Kurd di vê pêvajoyê de ecêbek ku derketî holê ev bû. Me berê jî anîbû ziman xwaziya di vê pêvajoyê de Apê Mûsa sax bûye û bi terz û usluba xwe ev rastiya koma ku nikare bi xiyaneta xwe jî rabe vegotana. Ji ber ku me hunera Apê Mûsa fêm nekiriye, kêm fêm kiriye em niha bê mecal in. Dîsa jî gotineke pêşiyan xwe di serê mirov de hirde û virde dike, dilivîne: dibêjin, ‘golikek navê garanekê diherimîne’. Hezar xwazî bi ‘golikê’.
Em çima wisa ‘giran’ diaxifin? Na, ez dibêjim qet jî ji bo ENKS’ê ev gotin ne giran in. Mînak, hemû kesên dîroka xiyanetê di şerê rizgariya neteweyan de kêm zêde dizanin, dizanin ku xiyanetkarên neteweya xwe bi roleke çawa rabûne. Bigire ji Cezayîr, Afrîkaya Başûr, Vîetnam û heta bi xiyaneta di berxwedanên Şêx Seîd Efendî û Seyîd Riza de tê zanîn. Li her derê cîhanê wisa bûye. Ev hêzên Xiyanetê yên wekî PDK û ENKS bi vê jî nizanin. Mîsal, xiyanetkarên Koreyê bi Koreya Başûr hatin xelatkirin. Nizanim li Başûrê Afrîka çi tişt girtin. Xiyanetkarên li ber Mao, çûn li giraveke jêra Sînê dewlet avakirin. Rayber û Zeynel piştî ku serê Elî Şêr û Zarîfe dan dewleta Tirk çend quruş xistibûn berîka xwe. Lê belê bi îstîxbarata Parastina PDK’ê çendîn û çendîn gerîlayên azadiyê şehîd bûn, ez ne bawerim Tayib di pêşberê vê de quruşek jî dayibe Mesût Barzanî! Piştî ku Efrîn hate dagirkirin, ENKS bi perspektîfên Mala Barzanî hê zêdetir xwe xiste nava opozîsyona Sûriyê. Wekî hêzeke opozisyonê tevgerî. Li gel wan xwe nîşan da. Bi gotin û sekna xwe ya li dijî Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê wisa xuya dike ku çend saziyên xwe çêkirine. Lê belê xiyanet jî be ti destkeftên wan ên mayende heya niha xuya nakin. Ji dagirkirina Girê Spî û Serê Kaniyê devê tehmxweş nebû. Ya din jî, herî dawî dema dagirkirina Til Rifaat û Şehba, ti bandora wan ku ENKS propaganda dikir, ti nebû. Tenê ev tişt kirin: Li gorî ku welatparêzên penaberên Efrînî neqil dike û tîne ziman, hin grûbên ku dixwestin xwe bigihînin seyareyên Herêma Xweser birin teslîmî MİT’a Tirk kirin. Lê em nizanin ku di berdêla vê xiyaneta xwe de ji MİT’ê heqdestê xwe girtin yan na! eger hûn ji min bipirsin, ez bawer nakim!
Niha hatiye li ber çi sekiniye?
Kêlî hene, bedelî çendîn salan in, roj hene bedelî bi deh salan in, bedelî sed salan in. Mînak, piştî 27’ê Mijdara 2024’an eger gotin di cihê wê de be, zeman difire. Kêliyek, saniyeyek bedelî sed salan e. Yanî çi? Rojeke tenê jî eger mirov heqê wê nedê, dîroka gelan, dîroka gelê Kurd ew ê ji vê neyînî bi bandor bibe. Vaye di vê rewşê de gelê Kurd û gelên herêmê ji ENKS dest berdan e, hêviya xwe jê qut kirine û hatiye fêmkirin ku êdî ENKS naxwaze ji bo gelê Kurd, heta ji bo xwe jî tiştekî bike! Ji ber ku her kêliya vala diçe wê dîroka bi sed salan diyar bike. Lê ev hêz ti tişt ne xema wan e. Ev bi temamî hatiye fêmkirin.
Temam, hatiye fêmkirin; hêzên xiyanetkar ên wekî Mala Barzanî û ENKS ji bo xwe û ji bo gelê Kurd ti tiştî naxwazin. Ji ku tê fêmkirin? Ev li mehekê derbas bû, xwe safî nekirin yan jî ji bo berjewendiyên gelê Kurd û Bakûr û Rojhilatê Sûriyê nêrîn û sekn nedan pêş. Tenê tiştek dimîne: Gelo ji bo berjewendiyên dewleta Tirk xwe giran dikin ku gelê Kurd û gelên herêmê, bêyî destkeft bimînin. Ku dewleta dagirker a Tirk qezenc bike?
Wê demê ENKS heq dike ku yek rabe jê re bêje ‘tu ne qirêja ber simê golikekê yî jî’. Ma eger welatparêzek rabe û jê re wisa bêje em ê çi ji wî/wê welatparêzî/ê re bêjin? Kî dikare çi bêje?



# ‘Divê gel li hember pêvajoyê şiyar be’

Berdevka Meclisa Jin a PYD’ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Horiye Şemdîn da zanîn ku ji bo şîrovekirina geşedanên dawî yên li Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê diqewimin, ew rêzecivînan ji gel re li dar dixin û got, “Pêwîste gel li hemberî siyaseta ku tê meşandin û girîngiya parastina axa xwe; serwext be.”

**Zana Roj/ Qamişlo**

Di pêvajoya heyî de, li Sûriyê û tevahiya herêmê gelek guhartin û veguhartinên girîng pêk tên. Pirojeya Rêveriya Xweser ya ku bi têkoşîna xwe ya zêdetirî 14 salan bi Şoreşa Sûriyê re daye destpêkirin û heyanî vê kêliyê jî berdewam dike, rol û misyoneke bingehîn di pêşeroja Sûriyê de dilîze. Li ser van bingehan hebûna Rîveberiya Xweser û gelê Kurd di pêşeroja Sûriyê de dibe mijara nîqaş û hizirandinê ya tevahî Raya giştî û hêzên navnetewî. Her kes dixwaze helwest û pirojeyên Rêveberiya Xweser di vê demê de nas bike. Ji ber Rêvebriya Xweser bi hêzên xwe yên QSD’ê di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de cîhanê ji metirsiya Terorê diparêz e.
Bi hemdemiya van guhartinan re dagirkeriya Trikiyê û komên çeteyan berê xwe dan herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi giranî girtiye hedefa xwe. Bi tayebt Bendava Tişrînê ya ku jêdara fermî ya av û enerjiyê ye; xistiye armanca xwe. Bê guman di vê demê de ya herî girîng parvekirina rewşa dawî bi gelên herêmê re ye, û girîngiya meşandina têkoşînê û xwedîderketina li pêvajoyê ye. li ser vê bingehê Jinên di Partiya Yekîtiya Demokratîk de PYD e de cih digrin pêşengtiya vê yekê kirine û dest bi civînên berfireh ji jinên herêmê re kirine. Girêdayî vê yekê Berdevka Meclîsa Jin ya PYD‘ê Huriye Şemdîn ji rojnameya me re axivî.

**Parvekirina geşedanên Siyasî, leşkerî û siyaseta şerê taybet bi gel re**

Huriye de destpêkê de da zanîn ku bi guhartinên ku tên rûdan re divê parvekirin bi gel re bê çêkirin û wiha got: “Di van demên dawiyê de gelek geşedanên herêmî û cîhaî hatin rûdan. Di Sûriyê bi taybet de piştî rûxandina Rêjîma ku temenê wê zêdetirî 60 salî ye li ser gelên Sûriyê serwer dikir de, piştî aloziya 14 salan di roj û şevekê de hate hilweşandin û li şûna wê HTŞ’e hate ser serweriyê. Her wiha êrişên dagirkeriya Tirkiyê bi van guhartinan re kêliyekê jî li ser herêmên Rêveberiya Xweser ya ku bi armanca qirkirina gelê Kurd û hilweşandina rêvebriyê tên kirin; nehatin rawestandin. Bi tayebt yekem care ku cihekî herî girîng di herêmê de xistiye hedefa xwe ew jî Bendava Tişrînê ye. li ser bangawaziya Rêveberiya Xweser bi hezaran gelê herêmê berê xwe dane bendavê û di şexsê bendavê de parastina ax û destkeftiyên Rojavayê Kurdistanê dikin.
Bê guman parvekirina van geşedanên siyasî û leşkerî bi gel re her wiha li hember şerê taybet ya ku ji aliyê dijmin ve tê birêvebirin divê em û gel serwext bin. ji lewra em weke jinên PYD’ê me helmleyekî civînan ji bo gel û bi taybet ji bo jin daye destpêkirin”.

**Bi pêşengtiya jin rêzcivîn di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate destpêkirin**

Huriye da zanîn ku ev hemle bi pêşengtiya jin li tavahî herêmê hatiye destpêkirin û domand: “Şîrovekirina rewşa siyasî ya ku li herêmê tê jiyan kirin her dem ji aliyê me ve bi riya civînên giştî bi gel re tên parvekirin. Helbet weke xebatên xweser jî ev yek tê meşandin. Beriya şeş mehan di pilanameya me de weke perispektîv ku Meclîsa Jin a Partî têkildarî rewşa siyasî civînên girseyî li dar bixin, lê ji ber pêşveçûnên ku hatien rûdan hate sekinandin. Ji ber vê yekê jî niha pêdivî hate dîtin ku em vê pilanamyê weke hemle di vê pêvajoyê de bixin meryetê. Ji lewra ev dem girîngtirîn deme ku gel li hember her tiştî şiyar be û nekeve xefka siyaseta şerê taybet ya ku di nava gel tên belavkirin. Herwiha weke erkên welatparêziyê li hember pêvajoyê û girîngiya tevlîbûna berxwedana Bendava Tişrînê, Tişrîn ji bo me çi ye û QSD’ê hêzeke ku ne tenê gelê Kurd diparêze ji bo hemû pêkhateyên herêmê û Sûriyê şer dike ye. Diviyabû em vê yekê em bi hemû gelên xwe re û jinan re parve bikin. Ev civîn nêzî hefteyekê ye hatine destpêkirin. Li tavahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatine destpêkirin û ji bajar û bajarokan de destpêkiriye”.

**Rojevên sereke yên rêzecivînan**

Huriye bal kişand ser naveroka van civînan herwiha çiqas hatin qebûkirin û wiha pê de çû: “Ji mijarên sereke yên ku me di van civînan de nirxandine de; êrişên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser herêmê bi giştî û armanca wan ji dagirkirina Bendava Tişrînê. Herwiha girêngiya çûyîn û sekna gel ya ji bo bendavê bi taybet bi pêşengtiya jin. Herlbet gelek bedelên giran li ser bendavê di encama hedefgirtina dagirkeriyê de hatin dayîn gelek jin hatin şehîdxistin û birîndar jî bûn. Yek ji wan jî Hevseroka PYD’ê ya Kantona Qamişlo Menîce Heyder şehîd ket. Ya din jî girîngiya piştgiriya QSD’ê ya ku ji bo hemû gelên herêmê şer dike. Ev rojev û gelek mijarên girîng cihê xwe di van civînan de girtin.
Bi taybet li herêmên rizgarkirî ev civîn bi giranî hatin lidarxistin. Bi rastî jî neqebûlkirina wan ji hişmendiya HTŞ û kiryarên ku niha ji aliyê komên çeteyan ve tên kirin; derketin pêş. Li hember wê jî qebûlkirinek û têgihîştinek ji rewşa dawiyê re hebû. Bi taybet jin dikare xwe çiqas birêxistin bike û li hember vê rewşê berxwedaniyeke çawa bike hate nîqaşkirin”.



**`Hevpeymana Jin misogeriya mafê jin di Sûriyê de ye`**

Huriye di dawiyê de da zanîn ku gelek piroje û xebatên wan ji bo pêşeroja Sûriyê di pilanameyê de ne û wiha qedand: “Reşnivîsa hevpeymana jinê ya ku hatiye nîqaşkirin û amedekirin, tê de nêrîna hemû jinan hate girtin û bi awayekî ku bikeve xizmeta tavahî jinên Sûriyê û bi taybet ji bo parastin û misogeriya mafê jin hatiye amedekirin. Ev Hevpeyman ji bo cihgirtina jin di destûra Sûriyê ya pêşerojê jî digre nav xwe, ku Sûriyeke demokrat nenavendî bê avakirin. Di bingeha guhartina zihniyet û îdeolojiya Sûriyê de divê xebat bê kirin. Li ser van bingehan gelek xebatên me yên derve û hundir jî wê bêne kirin. ya din li herêmên Rizgarkirî xebatên me wê bên domandin bi taybet emê panelên diyalogî li ser rewşa jin bi giştî di Sûriyê de her wiha erk û misyona li ser wan di qada civakî û siyasî de bêne li darxistin”.

## Dewleta Tirk ji bo dagirkirinê li benda piştgriya Trump e



**Zekî Bedran**

Li Sûriyê koçberîyeke mezin ya li ji derve û hûndirîn hat jiyan kirin. Ji welatên weke Tirkiyê jî, ji bona wan koçberan biqewitînin her tiştî dikin, ew û dewletên Ewropî ji bona paşde vergerê lez bikin wêrekî didin wan. Di navenda Sûriyê de, bimilyonan di nav rewşa koçberîyê de ne. Hejmarek ji wan vegeriyan welatên xwe, hejmarek jî di nava hewildanan da ne. Herî kêm ji bona vergera wan ti astengî nînin. Ji bona jiyana xwe bidomînin û debara xwe pêkbînin pewistîyê wan bi demekê heye. Di nav Sûriyê de jî, ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk kurdên ku koçberbûne nikarin vergerin welatê xwe. Di vir de rewşa Kurdan istîsnayek e. Ji ber ku dewleta Tirk li ser Kurdan paqijîyekê bizanebûn û etnîkî xwistin di merîyetê de. Li kêleka artêşê, çeteyên çekdar rêxistin kir û ew kirin bela li serê gelê herêmê. Wan çeta ne jî mal û milkên gel hemû dizîn û talan kirin. Revandin, zext û girtina bacê kirin şêweyekî jiyanî. Li Hemberî gel kiryarên şer û mirovî pêkanîn. Ev tomet û kiryarên hatine kirin di rapor û lêkolînên NY (Neteweyên Yêkbûyi) û saziyên mirovî yên din de jî hatin teqez kirin. Lê rayagiştî ya cîhanê hewildan û tevgerê wan di wê mijarê de çênebû. Ji rêbazekî qirkirin û dagirkirina dewleta Tirk re çavgirtin û piştgrîdana wan êrîşan heye.
Niha jî rejîma Baas hilweşîya ye. Di rewşên asayî de pêwîste li pêşîya vergera koçberan de ti astengî nebin. Lê kurd nikarin vegerin li ser xak û welatê xwe. Gelê Efrînê li Til Rifet û Şehba jî careke bi êrîşan rûbirû man. Li wir jî koçberî jiyan kirin, hejmarekê zêde welatiyên Efrînê derbasî Tebqa û Raqa bûn. Li Minbicê jî rastî êrîşan hatin û li wir jî mecbûrî koçberiyê hatin kirin. Bi sala ne, welatiyên Efrînê li konan de di rewşên pir zor û zehmete de jiyan dikin. Erdogan jî, hewildan dike ku welatiyên Sûriyê vegerîne welatên wan, lê derfet nade kurdên ku li herêmên dibin dagirkeriya artêş û serweriya wê dene vegerin cih û warên xwe.
Welatiyên Efrîn, Grêspî û Serêkaniyê dê kengê vegerin ser axa xwe? Bersiva vê yekê nîne. Di vê mijarê de tu însiyatîf û dengek ji Neteweyên Yekbûyî dernakeve. Ji HTŞ’ê ku desthilatiya Şamê ya nû ye, deng jê dernakeve. Divê dibin sîwan û piştgiriya civaka navneteweyî, Neteweyên Yekbûyî û desthilatdariya Şamê vegerandina Kurdan a li ser xaka wan bê misogerkirin. Bi sed hezaran mirov ji hilberînê hatine veqetandin û ti alîkarî û piştgiriya aborî ya navneteweyî nagirin. Divê êdî dawî li van kiryaran bînin.
Pirsgirêkekî din a girîng a Herêmên Xweser jî êrîş û ferzkirina şer a dagirkeriya Tirkiyê ye. Rêveberiya John Biden hewl da ku dewleta Tirk şer rawestîne û agirbestê bike, lê bê encam ma. HTŞ’ê li dijî êrîşên li Tişrînê daxuyanî neda. Ev bendav girêdayî tevahî Sûriyê ye. Elektrîk û av ji Tişrînê ji Helebê re tê dayîn. Bendav ne tenê ji bona xizmeta herêmên Rêveberiya Xweser in, çavkaniyekî neteweyî ye. Lê Tirkiye kiriye pirsgirêk û bi mehan e hewl dide êrîşî vê bendavê bike û dagirbik e. Bendav ne ya Tirkiyê ye, ne di nav sînorê wê de ye. Nêzîkî sînorên xwe jî nabe. Armanca wê ji girtina bendavê, hilweşandina binesaziya aborî ya rêveberiya xweser û dorpêçkirina herêmên xweser e.
HTŞ’ê ti daxuyaniyekê ji bona raya giştî nedaye. Ne diyar e ku ew piştgirî dide van êrîşan an jî li dijî van êrîşan e. Ger HTŞ hikûmeta tevahî Sûriyê be, divê ev êrîş û şerê ku ji aliyê hêzeke dagirker ve li ser xaka wê tê kirin, red bike û li dijî wê derbikeve. Ev şer û êrîş ji bo çareseriya pirsgirêkên Sûriyê astengiyeke mezin e. Şer jî ewlehî û aramiya heyî xirab dike. Bi milyonan mirov li herêmên Rêveberiya Xweser dijîn. Ev der herêma herî aram û ewle ya Sûriyê ye. Her wiha bi modêla rêveberiya herî demokratîk tê birêvebirin. Hemû bawerî, çand û gel mînaka jiyana hevpar a wekhev û azad nîşan didin û jiyan dikin.
Armanca reveberiya Erdogan ne azadî ne jî anîna demokrasîyê ji Sûriyê ye. Dixwaze Sûriyê weke ku girêdayî wê be birêve bibe. Her wiha armanca wê ya bingehîn jî weke her carê, têkbirina kurdan û ji holê rakirina destkeftiyên wan e. Ev e ku ji berxwedana Tişrînê di nava wan de hêrseke mezin avakiri ye. Di vî warî de jî tevî navbeynkariya DYA’yê jî agirbest nepejirandin. Li benda desthilatiya Trump sekinîn û xwestin şansê xwe biceribînin. Rêvebiriya Biden bû navbeynkar nehişt ku şer belav bib e. Lê belê Tirkiye ji ber ku nekarî encama ku tê xwestin bidest bixe biagirbestê razî nebû. Li bendê ma, bi hêviya ku dibe ew ji rêveberiya nû ya DYA re bigihin rêkeftinekê û herêmê dagirbikin. Helbet di vê navberê de êrîşên dagirkeriyê berdewam kirin. Çavên wan ewqas tarî bûn ku li ber çavê cîhanê giştî, bi sedan sivîl qetil kirin.
Ji aliyekê ve Tirkiye bi Îmraliyê re hevdîtinan dike û bi lez û bez banga çekberdanê dike. Lê ji aliyê din ve jî, ji bona têkbirina kurdan plansaziyan dike. Ger piştgiriya ku dixwazin ji Trump bigirin, êdî hewcedariya wan bi pêvajoya Îmraliyê namîne. Ev wêneyê ku ew didin, ziman û hişmendîya wan jî pir jehr û tarî ye.



## Rêwîtiya Aştiyê…

**Farûk Sakik**

Serokê Amerîka yê wê demê Bill Clinton piştî 21 salan di Cotmeha 1994’an de serdana Sûriyê kir. Ji 4 saetên hevdîtina Bill Clinton-Hafiz Esad, 3 saet jê der barê Rêber Apo de bû.
Ev hevdîtin starta Komployê bû. Perde ewroj vebû û di 15’ê Sibatê de ev perde hat girtin. Perdeyeke nû ji nû de vebû. Evcar li dika dîrokê Rêber Apo hebû. 26 sal ev rola xwe ya ji bo aştiya cîhanê, li hember hêzên modernîteya kapîtalîst ji bo parastina gelan têdikoşiya.
Di sala 2023’yan de şerê cîhanê derbasî qonaxeke nû bû. Di vê serdema nû de diyar e ku dizayneke nû di rojevê de ye. Îsraîl li Rojhilata Navîn hakîmiyeta şer girtiye bin destê xwe. Dema ku 26 sal berê komplo dane destpêkirin wan bawerî anî ku vê tevgerê vî rêberî wê di 15’ê Sibata 1999’an de ji holê rakin. Nebû-nikaribûn. Dema ku îroj ji nû de vegeriyan herêmê dîtin, ev tevger û ev rêber diha bi hêz û mezintir bûye. Ji bo vê yekê di hin çareseriyan de ji Rêber Apo alîkarî xwestin. Rêber Apo ji bo parastina mafê gelên herêmê qebûl kir. Hevdîtinan dest pê kir. Heyet çûn giravê û vegeriyan. Ev bazariyek û lihevkirinek e. Li ser çi û çawa lihevkirin em nizanin di rojên pêş de wê zelal bibin. Herkes li benda dengê Rêber Apo ye.
Bi peyamên Rêber Apo di nav civaka de hêviyek peyda bû.
Îroj, bi vê baweriya civakê, li ser navê gelan bi paradîgmaya xwe daxilî siyaseta Rojhilata Navîn dibe. Di demeke wiha de ji bo bi tenê nemîne û bihêz be, divê ku herkes erk û berpirsyariya xwe bi cîh bîne.Herkes li aliyekê çawa dikare tevlî vê rêwîtiyê bibe ji îro de amadekariyên xwe bike. Rojên giran û zehmet li pêş me ne. Rêwîtiya aştiyê ji şer zortir û zehmetir e. Di vê rêwîtiyê de aliyên bi salan ji vî şerî sûd wergirtine ji bo şîrket, îqtidar, berjewendî û dewlemendiya xwe biparêzin-bidomînin wê astengiyan derbixin. Aha wa di siyaseta Tirkiyê de zimanê li hemberî vê rêwîtiyê tê bikaranîn ji anha de îşaretên wê di paşerojê de zehmetiyên çawa derkevin pêş aştiyê nîşan dide.
Di demek waha de di 10’ê Sibatê de Kontra-Abdulkadîr Selvî ku bi salane di bin siya AKP’ê de telisiye, dest bi êrişan kir. Bi terzek bêedebî ji bo hin nirxên Kurdan peyva ‘terorîst’ bi kar tîne. Kontra-Selvî dizane heger rêwîtiya aştiyê bi encam bibe, siya ser wî wê vekişe û li bin tavê bitevize. Rêvebirên Tevgera azadiyê van talûkeyan ji anha de dibînin û di daxuyaniyên xwe de balê dikşînin ser vê yeke. Dixwazin Rêber Apo di şertên azad de bikaribe nexşeriyê bi rê ve bibe.
Murat Karayilan jî di Stêrk Tv de dixwest balê bikişîne ser niyeta kesên wek Kontra-Selvî. Dibîne ku kesên wek vî kontrayê wê derkevin û li pêşiya Rêber Apo bibin asteng. Wek vî kontrayî gelek kesan Murat Karayilan xelet xwendin û fahmkirin. Bi tenê van gotinên wî bersiv dide herkesî.
“Divê Rêber Apo azad bibe. Ji derveyî Rêber Apo kes nikare van hevalan îkna bike ku çek berdin. Destpêkê divê Rêber Apo azad bibe û li cihekî azad, bi rêya teknîkê dibe, rêbazên cuda dibe, heyetan dibe, li ser vê pêvajoyê bisekine. Angu bangeke sembolîk bê guman hêja ye. Lê piştre jî divê bikeve meriyetê.”
Bi tene dixwaze rê li pêşiya rêwîtiya azadiyê vebe û Rêber Apo jî azad be.